15 GÜNLÜK EDEBİYAT SANAT VE DÜŞÜN DERGİSİ

# Politik ART

4 Mijdar 2017 Şemî

HEJMAR: 227

## Kêliya qerisî fotograf






## Kalemêr û darçixare

"Di hilkişîneke xwe ya serê Araratê de li ser rêya me ya meşê zozanek hebû, û li vê zozanê xelkê em kirin mêvan. Vî apê me ku em di wêne de portreya wî dibînin texsîr nekir û bi îkrama wî me zikê xwe têr kir. Wêne ji bo ku diyarî wî bikim hat girtin. Min wêne gihande wî. Hêvîdar im ku wî jî bi qasî min hez ji vî wêneyî kiribe."

Wêne: Gökmen Onay

www.arsivakurd.org



Wêne: Xanê Uçar

### Şeva Xewar

şeva xewar şûrê xwe danî, mertalê xwe danî
bajarî vegeriyan ji bo dengek belav bibe
balindeyekê kire ureur û nikûlê xwe tûj kir
ber bi stêrkan ve çû weke stêrkeke nûgihaştî
niha li pey dengê çiyayekî diçim
dibînim ku çi reng e li aso veşartî
dibiriqe siya ji asîman diherike
dûxana bayê xerbî û çend dilop ax
naşibin tu tiştekî û xwe jî
bi carekî dimire diya min
yan qêrînek ji mala neyaran
hemû derî dipekin ji pişt xwe ve
pace kor dibin, her kes dipeşkile
her kes navê min ji bîr dike û ez jî
tu dibêjî qey ez xewna yekî din dibînim


Selîm Temo

**Herausgeber:** *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Hans-Böckler-Str. 16 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Özgür Reçberlik politikart@yeniozgurpolitika.org

## Ew peyva efsûnî ku em pirr caran dibihîzin

# ESTETÎKA FOTOGRAFÊ

Ali Riza KILINÇ



Peyva 'estetîk'ê hema bibêje di hemû beşên hunerî de derdikeve pêşiya me. Nexasim dema mijar fotograf be, peyva 'estetîk'ê hema hema di her firsendê de weke pîvaneke nirxandinê gelek caran tê bikaranîn. Ji ber vê yekê jî eger em bixwazin vê peyvê bi nav bikin, ev wê ewqas hêsan nebe. Gotina 'estetîk'ê bi taybetî weke nêrîna şexsî yan jî ecibandina şexsî tê bikaranîn. Bi awayekî ji rêzê bi pirranî tê gotin, "Kêfa wî weha jê re tê" yan, "Ev mijareke kêfa dil e" û bi vî rengî li hemberî rexneyên ku tên, weke navgîneke parastine derdikeve pêş. Eger em beşa teknîkî û kompozîsyonê ya fotografê, ango aliyên weke ronahî, sî, kadraj û çarçoveyê li aliyekî bihêlin, wê demê em ê rê li ber wê yekê vekin, pesnê wan wêneyên ji rêzê yên ku ji afirînêriyê û xweseriyê ti par negirtine bête dayîn.

Ji aliyekî din ve bikaranîna makîneyên fotografê yên dijîtal her ku diçe belav dibe. Piştî ku telefonên biaqil, tevî medyaya civakî ketin jiyana me, sînorê estetîka fotografê hîn zêdetir ziyan dît. Bi navgînên medyaya civakî yên weke instagram, whatsapp, twitter û facebookê nasnameyeke nû tê çêkirin. Bi vê yekê êdî hunerê fotografê yan jî pênaseya 'estetîkê' ku di vê qadê de tê bikaranîn, xeter heye ku di dewsa giraniya wê ya dîrokî de, 'estetîk' êdî weke wêneyeke ji rêzê, yan gotineke ji rêzê cih bigire.


### Dîmenên dijîtal li her cihî ne

Berê dema em diçûn pêşangeh yan jî galeriyeke fotografan yan jî wêneyan, weke temaşeker cih û sînorê gotinên ku me dianîn zimên yan jî şewazê ecibandina me hebû. Yên ku bi ked û hewldanên xwe di vê meydanê de emir bihurandine jî, der barê wan berheman de bi wan nirxandinên xwe ku li gorî nihêrînên estetîkê yan jî ecibandinê êdî teşegirtine û giranbiha bûne, rexne û nihêrînên xwe dianîn zimên. Bi vê yekê ji bo huner jiyana mirovan hêsan bike û derfetan biafirîne çend gotin dianîn zimên. Lê belê di demên dawî de dîmenên dijîtal bi rêya înternet û medyaya civakî bi awayekî bi lez kete her aliyên civakê. Van gavên di qada teknolojiyê de hatin avêtin, bêguman hiştin ku şêwazên binavkirin û pênasekirinê yên gelek têgehan jî biguherin. Hin kesên ku bi huner re mijûl dibin, ev yek weke 'civakbûna huner' bi nav kirin û bi bi vî rengî guftugo kirin. Lê belê, fenomentiya tinekirina dîmenan ne tiştekî nû ye. Ev ne civakbûna huner bû, jixwe tiştek bû ku ji berê ve hebû.




### Sînor li ber tinekirinê nemane

Weke civakê bi sedsalan e ku em bi vê dijîn. Bi awayekî din, şêwazekî cuda yê tinekirina desthilatdarî, hêz û hikumraniyê ye ku di her kêliyê de em bi siya wê ku li ser me daniye, dihesin. Bi kurtayî, ev çîrokeke dirêj e ku em heta îro jî bi dîmenên vê çîrokê re rû bi rû dimînin. Çawa ku huner heta niha di nav lepê desthilatdariyê de weke navgînekê hatiye bikaranîn, weke navgîneke îdeolojîk ti carî ji ber deriyê me dûr neketibe, niha jî bi rêya teknolojî û dîmenan dixwazin ew şêweyê jiyanê hîn zêdetir were tinekirin. Berê derfetên vê bi sînor bûn, lê belê niha di warê tinekirinê de hemû sînor ji holê rakirin. Herkes li ser dikê û di navenda dikê de ye. Hin tişt li holê li ber çavên me diçin û tên; dînîtiyeke ecêb û sosret e. Hin caran sembol dipeyivin, hin caran jî em dikarin di nav hemû tiştan da ku ew temsîl dike, wenda bibin.



Hin kesên ku bi hunerê re mijûl dibin ev yek weke 'civakbûna hunerî' bi nav kirin û bi bî vî rengî guftugo kirin. Lê belê, fenomentiya tinekirina dîmenan ne tiştekî nû ye.

### Tijekirina pîvanên estetîka fotografê

Di vê sedsala teknolojiyê de afirînerî, xuliqkarî û xweserî êdî werdigere nasnameyeke tinekirin û lezê, lê belê dîsa jî hewce dike ku em bi temamî nerênî bifikirin? Bêguman na! Weke ku di her warî de em dibînin, jiyan di vî warî de jî wê hêz û hunerê xwe yê bijartin û neqandinê nîşan bide. Wênegirên ku ji çarçoveya klasîk wirdetir jî dibînin, ziman û şêweyekî li gorî xwe diafirînin û karin bi insan, xweza û çîrokan re bi temamî danûstandineke yekser û zelal çêkin jî hene. Bêguman em bi vê yekê qala wan kesan dikin ku dikarin bi nihêrîna xwe ya xweser nava pîvanên estetîka fotografê tijê bikin.

Ew jî yek ji van e…

# Rêwîtiya welatan kêliyên cemidî dicivîne



Luqman GULDIVÊ


Li bajarê Lehistanê Krakowê bi kuratoriya Dr. Joanna Bochenska li Pirtûkxaneya Bajêr pêşangeheke wêneyan a wênegir û çiyager Gokmen Onay ê ji Bazîdê hat vekirin. Pêşangeha ku 5´ê Cotmehê deriyê xwe bi navê "Xwedê Kurd afirandin da ku çiya xalî nemînin" wê heta 11´ê Mijadarê jî ji xelkê re vekirî be. Li ser vê pêşangehê û bi giştî li ser fotograf, maneyên wêne, estetîka wê, tecrûbeya şexsî û fotograf weke huner em hem bi Dr. Boshenska û hem jî bi Gokmen Onay re peyivîn.

Fotograf, nexasim jî klîşeyên kêliyan ji ber rawestandina kêliyê di wêneyekî cemidî de tesîreke ecêb li mirovan dikin. Kadraj, reng, ronî vediguherin hêmanên ku encama hunerî û tesîra li temaşevanê wê diyar dikin. Lê gelo, hunerek dikare bê dildariyê tenê weke pîşe bibe hostekariyeke ferdî? Tişta Gokmen Onay li ser wênegiriya xwe dibêje, bersivê dide vê pirsê jî: "Dema min ev kar kir, min xwe azadtir hîs kir. Lê hîna jî ji bo ez debara xwe bikim, di karê cuda de dixebitim. Lê ez bi xwestekeke mezin fotografan digirim. Ti hewldana min nîne ku ez vî karî weke pîşeyekî bikim." Sohbeta bi canik Bochenska û camêr Gokmen re li ser fotograf, pêşangeh û huner ji bo we xwendevanên ezîz e.

***Ez dixwazim bi tercîha we ya ji bo navê pêşangehê dest bi pirsên xwe bikim. Çima "Xwedê Kurd afirandina da ku çiya xalî nemînin"?***

(Ji ber ku biryara nav Dr. Bochenska daye, ew bersivê dide) Navê vê pêşangehê ji peyva orîjînal "Allah Kurtleri yaratti daglar hali kalmasin diye (Xwedê Kurd afirandina da ku çiya xalî nemînin)". Ez gotineke orjînal bi kar tînim ji ber ku heger wisa nebe, fikra vê peşangehê wê ne zaf zelal be. Em baş dizanin, ev gotineke ne baş bû ji bona Kurdan ya ku Tirkan carinan bi kar dianî. Û gelek gotinên din yên wisa hebûn...Lê gava ku min weke jineke biyanî, ji derve ev gotin bihîst ji bo min wek helbestê dihat. Heger em peywenda xerab rakin, peyv bi xwe balkêş û xweşik in jî. Yanî bê guman em dikarin peyva "hali" weke "tenê" fêm bikin. Û ev pêşangeh, maneyeke wisa jî heye ku em di nava tarîtiyê de ronahiyê bibînin. Bi qasî ku Tirk ewqasî peyvên xerab ji bo Kurdan bi kar tînin, em ê niha ji ber vê yekê xemê nexwin û hêzê peyde bikin ku bedewiyê di nav wan de bibînin. Heger em dikarin bibînin belkû Tirk jî dikarin, heger bedewî neku kirêtiyê bibînin, nikarin ji dilên xwe rakin. Problema wan ev e ku bi dirêjayî, gelek salan tenê xerabî didîtin ji ber ku rejîmê tenê behsa xerabiyê dikir. Ew ji wê ditirsiyan, rejîmê xwest wê ji holê rake. Em dibêjin metirsin, bedewiyê bibînin, em jî îro di nava peyvên we yên xerab de dixwazin bedewiyê bibînin. Lewma navê pêşangehê fikra min bû, lê bi dilê Gokmen jî bû. Ji ber ku wêneyên wî jî dinyayeke wan a wisa heye ku divê mirov raweste û bi dîqet li wan binihêre. Carinan em dinyayeke pir sade û xemgîn dibînin, lê hê jî ew dikare bedewiya mirovan bi detayên piçûk, bi dîqeta ji bo hîs û tevgerên wan nîşan bide û bi ya min berhemdarî jî ev e, ne ku peykerên mezin û bi zêr.

Min Gokmen beriya bi salan nas kir, ji destpêka nasandina min a Kurdistan û Bazîdê sala 2002´yan, lê tenê niha min karibû pêşangeha wî saz bikim. Wî negatîfên xwe dan min da ku karibim wan bi qaliteyeke baş scan bikim û da ku em bi hev re wêneyan ji bo ve pêşangehê hilbijêrin. Min gelek wêneyên wî berê dîtin, lê gava ku min ew scan kirin, kêfa min zaf jê re hat û min pirr xwest pêşangeha wî li Krakowê çêbe. Niha em jî ligel Xanima Chris Kutschera, Edith wêneyên Gokmenî ji bo Kurdistan Photolibrary ya projeya wê ya online ji bo nivîsandina dîroka Kurdan bi wêne hazir dike. Lê hêviya min jî ev e ku ev pêşangeh li Ewrûpayê bigere. Ev bêyî alikariya Kurdan û mirovên derve ne mumkin e. Em bi hêvî ne kesên bixwazin alîkariyê bikin! Bi saya piştgiriya fona Navenda Zanistê ya Lehistanê (NCN) pêşangeh amade ye û li xelkê vekiriye.



● Dema mirov berê xwe dide wêne, dibîne ku zarokekî cilûbergên ji temen û bedena xwe mezintir li xwe kirine, heye. Tevî ciwanên ku xizmên wî ne, pez biriye çêrê. Xerîbê mekîneya wênegir e û heta mirov bibêje bes jî bêguneh diyar e. Dibêjin, şivantî dezgeheke perwerdekirinê ye; ev birakê me bi pêlikên destpêkê yên vê dezgehê ve hildikişe. Bi bedena xwe ya piçûk pal daye Araratê, di kêliyeke xwezayî de sor bi xwe jî di bitûnê fotograf de gihiştiye.

***Di pêşangehê de 52 fotografên ku cenabê te girtine hene, pîvanên neqandina wan çi bûn?***

(Ji vir û bi şûn ve Gokmen Onay berivan dide) Ev wêne min û Joanna bi hev re neqandin, lê belê hevalên me jî bi fikrên xwe ji bo vê alîkarî dan me. Dema me ev fotograf hilbijartin, me hewl da ku rêze-fotografekê çêkin ku karibe Bazidê û girêdayî wê Kurdan bi her awayî îfade bike. Me xwest bi hin wêneyên ji çalakiyên çandî, çalakiyên sporê, jiyanê, ji jiyana polîtîk ya bajêr, jiyana wê derê bi xwe bidin nîşan.

***Di vê xebatê de wekî din keda kê heye?***

Li Krakowê xwendekarên zanîngehê û xebatkarên pirtûkxaneya bajêr di pêvajoya amadekariyê ya pêşangehê de xwedî kedeke mezin in. Fotografên ku me di pêşangehê de nîşandan, filmên negatîf me bi şêwazê dijîtal amade kirin. Ez malavahiya her kesa bi keda xwe alîkarî bi me re kiriye dikim.

Em dixwazin heman pêşangehê li welatên din jî nîşan bidin. Dibe ku li Ewrûpayê li çend welatên din jî bête nîşandan.

***Heta niha çend pêşangehên cenabê te yên şexsî çêbûn?***

Berî niha li Macaristanê, li bajarê Budapeştê di pêşangeheke têkel de fotografên min cîh girtin. Piştî erdheja li Wanê, bi navê "Wan hîn dijî" bi fotografên ku berî erdhejê û piştî erdhejê hatibûn girtin, me pêşangeheke têkel çêkir û fotografên xwe tevî xebatên hevalên xwe min nîşan dan. Ji ber vê yekê Krakow pêşangeha min a yekem a şexsî ye. Ez hewl didim bi hin fotografên xwe jî tevlî hin çalakiyên hunerî bibim. →

www.arsivakurd.org

◆ Di Kurmanciyê de ji bo çiya jî gelek nav hene, lê belê dîsa jî navên weke "cebel", "kuh" û "dax" ji zimanên cîran girtine. Peyvên "Cebel ekrad", "Kuh-î nuh", "Qerecdax" û hwd, hene. An em dikarin bibêjin ku çiya ji bo Kurdan dostê herî baş e. Dema dibêjin "kurtî", "çiyayî" yan "Kurdê çiya" jî Kurdistan welatê çiyayê xweşik e.




◆ Fotografên ku wate yan mijarekê îfade dikin di reş û spî de bi nihêrîneke hîn zelal û safî wêneyî nîşan didin. Lê di wêneyekî rengîn de ev bi baldariyeke zêdetir ku çav dixapîne çêdibe. Yan jî bi gotineke gilover em dikarin bibêjin, fotografê bireng behra nefsê ne, ji bo çavan.

# Bi Agirî re serpêhatiya wênegirekî

www.arsivakurd.org




***Ma di navbera estetîk û vegotinê de tewazûnek heye?***

"Balans" peyva "tewazûn" yan jî ahengê ya Kurdî tîne bîra min. Deng û gotina ku êdî di dawiya demê de dimîne tîne ziman. Di vê çarçoveyê de ew tişta ku estetîk e, bi demê re di nêrîna giştî de xwe digihîne nirxekî, ahengê digire. Dema deklanşor asê dibe, êdî ew gewher bi xwe derdikeve.

***Di navbera fotografên reş û spî û yên bi bêhtir rengan de di warê estetîk û vegotinê de cenabê te ferqeke çawa dibîne?***

Ji bo kesekî nabîne, reng bi gotineke çandî xwe çêdike. Dema roj derdikeve û ronahiya wê xwe dide der, hezar şêwazê rengê zîv derdixîne holê. Ji bo kesekî ku çavê wî dibîne her ku pêla reng nêzî hev dibe ferq zehmet dibe. Lê belê bi nihêrîna kor ji ber reşahiya li ber çav kêm dibe, ev ferq hesantir dibe. Di rastiyê de fotografekî ku em reş û sipî dibînin, hîn zelaltir tê dîtin. Fotografekî bi bêhtir rengan diwestîne û ne diyar e. Di vê çarçoveyê de fotografên ku wate yan mijarekê îfade dikin di reş û spî de bi nihêrîneke hîn zelal û safî wêneyî nîşan didin. Lê di fotografekî rengîn de ev bi baldariyeke zêdetir ku çav dixapîne çêdibe. Yan jî bi gotineke gilover em dikarin bibêjin ku fotografê bireng behra nefsê ne ji bo çavan.

***Cenabê te bi daxwaza xwe xwest bibe hunermendê fotografê yan bûyeran kir tu bibî wênegir?***

Bi awayekî xwezayî hunerê min ê wêne çêkirinê bi pêş ket. Lê min nedixwest ku ez weke pîşeyekî vî karî bikim. Di zaroktiya xwe de min xeyal dikir ku bibim şêwekarek, lê min nedixwest ez girêdayî vê daxwaza xwe bimînim. Di demekê de ez difikirîm ku xêzkirina resman wê min sînordar bike, min fotograf nas kir. Dema min ev kar kir, min xwe azadtir hîs kir. Lê hîn jî ji bo ez debara xwe bikim, di karê cuda de dixebitim. Lê ez bi xwestekeke mezin fotografan digirim. Ti hewldana min nîne ku ez vî karî weke pîşeyekî bikim.

***Dema cenabê te fotografên çiyayên Kurdistanê û Kurdan girtin, di vê demê de herî zêde çi bala te kişand, di pêvajoya demê de te çi guhertin dîtin?***

Di zimanê Erebî de 600 navên hêştirê hene, dîsa di zimanê înnuît de 30 navê berfê hene. Di Kurmancî de ji bo çiya jî gelek nav hene, lê belê dîsa jî navên weke "cebel", "kuh" û "dax" ji zimanên cîran wergirtine. Peyvên "Cebel Ekrad", "Kuh-î Nuh", "Qerecdax" û wekî din hene. Ango, em dikarin bibêjin ku çiya ji bo Kurdan dostê herî baş e. Dema dibêjin "kurtî", "çiyayî" an "Kurdê çiya" jî Kurdistan welatê çiyayê xweşik e. Çawa ku Kapadokya welatê hespên xweşik be, ew jî weha ye. Lê bi fikra min ne rast e ku em Kurdistanê tenê weke welatê Kurdan bibînin, wê demê em berê xwe ji wan çiyayên ku dostê wan yên herî baş in, diguherînin. Ji ber vê yekê ez Kurdistanê weke welatê çiyayan, mîna Katmandu dibînim û dixwazim navê Kurdistanê bi vî rengî bi kar bînim. Hêvî dikim rojek bê ku dema me got Kurdistan, herkes mîna berê weke "welatê çiyayan" vî navî bi kar bîne. Lê belê îro çiya bi bendavan dixeniqin û bê însan tên hiştin. Li bajarê kêleka avê, daketina deryayê weke civakîbûnekê tê dîtin. Lêbelê li zozanên bilind jî çiya seyrangehên cîvakîbûnê ne. Li çiyayan govend mil bi mil, li Deryareş horon dest bidest, li deştê bozlak çepik biçepik, li ege zeybek tilî bi tilî ye. Guherîna li çiya çiqasî hindik be jî, her tiştên însanî yên din ewqas bi lez diguherin. Fotograf çarçika kêliyên herî xweşik e, lê ji bo fotografekî bîranînê bigirin gelek insan ji çiyayan dihatin dikanên fotografan. Piştî ku mekîna wênegiriyê ji dikanan derket û kete nav destan, her dema ku mekîne didîtin û dengê flaşê dibihîstîn dikeniyan. Piştî demekê fotograf êdî bû navgîneke danûstandinê. Zarokan bi kêfxweşî li pey fotografvanan baz dida, pîr û kal jî bi meraqeke veşartî di bin çavan re li kadrajê temaşe dikir. Lê wê dema ku êdî fotograf weke delîlekê hat bikaranîn, însan êdî jê aciz bûn û êrîşî makîneya fotografê kirin. Mixabin di dawiyê de zarok teslîmî deklanşorê bûn û destê xwe rakirin. Bi vê yekê fotograf êdî di warê sembolê de di navbera deklanşor û tetika sîlehê de asê ma. Belkî jî wê dualîzma vî hunerî ya miqabilî pênûs û şûr wê ji vê derê dest pê bike.

***Ji bilî Kurdan û çiyayan jî hin mijarên fotografên cenabê te hene gelo?***

Li cihê ku ez digerim û li welatê ku rêya min tê re derbas dibe, hewl didim ku tevlî çalakiyên herêmî bibim. Ev jî di fotografên min de tê dîtin. Fotografên festîval, pêşbirk yan jî yên di çalakiyên siyasî de hatine kişandin, dihêle ku ew bajarê ku mirov lê digere baştir fêm bike. Bê guman mekan bandoreke mezin li ser mijara fotografê dike. Ya rastî, ew kêliya cihê ku mirov lê ye deriyê esasî yê kompozîsyona mirovî ye. Xebatên min bi vî rengî cihereng dibin. Di gelek fotografên ger û geştê de ez bûyer, insan yan jî xwezaya li kolaneke ji rêzê digirim. Hin caran ez van weke rêzefotografan, weke çîrokekê digirim. Weke mînak, weke karwanê asya ya dixwest biçe Filîstîne yan jî bajarên antîk yên Ege ye.





www.arsivakurd

## Civata sê jinan

Zozanên Ayderê ne, ji gundê xwe yê li zozanan piştî meşeke kurt gihiştine vir. Ji vir li gelî dinihêrin, sohbetê dikin û tiştinan dihûnin. Hersê jinên ji herêma Derya Reş in. Dema ku em bi erebeya xwe di ber wan re derbas bûn, me silav li wan kir, dema wan silava me vegirt, ha wê kêliyê min ev wêne girt.

## Keriyê pez û Ava Mezin

Li Heskîfê li ber çemê Dîcle ev wêne hatiye girtin, ku mixabin tehlûke heye di bin avê de bimîne, ji ber wê jî bibe bîranîne ku careke din pêk neyê. Kerî li gundên xwe vedigerin, li ber perên Çemê Dîcle digihin hev û rêya xwe dikudînin, carinan ev rêza pez bi kîlometreyan jî dirêj dibe.

# Çîroka Sîtavkê



## Ararat bi gelek sûretan

Li deşta Bazîdê em Araratan dibînin, ê piçûk û ê mezin. Ewrekî mîna wan bi heybet ku di dirûvê keştiya nuh de ye, weke aramiyeke piştî bagerekê li sertara çiyê disekine. Nexasim jî zivistanan dîmenên xwezayê yên bi vî rengî xwe li çiyê didin der. Dema ku ez bi vê kêliya nêzî çûna ava a rojê hisiyam, diviyabû bi wesaîtekê ez qederê pênc kîlometreyan dûrî bajêr biçim. Mixabin ji ber bajarvaniya bê ser û ber cih cihan Ararat ji nava bajêr xuya nabe.



Weke hunermendekî fotografê, maneya fotografê ji bo cenabê te çi ye?

Di zimanê Yewnanî de wateya ´foto´ ronahî ye û ´graf´ jî nivîsandin e. Bi awayekî giştî ev peyva ku tê wateya ´nivîsandina bi ronahiyê´, Kurdî de çîroka sîtavkê tîne bîra me. Ev peyv ji ´sî´ û ´tav´ê çêbûye.

Çîrok gelekî balkêş e. Çîrok behsa perwerdeya mîrzayekî li Enderûnê dike. Mîrza, di bin erdê de beyî ku ronahiya tavê bibîne perwerdeya xwe didomîne. Ji nişkê ve ji nav dîwêr ronahiyekê dibîne. Ji ber ku ti carî tîrêjeke ronahiyê ya bi vî rengî nedîtiye, hişê wî ji serê wî diçe. Êvarê dema mamosteyê wî tê perwerdeyê pirsa vê sîtavkê dike. Mamosteyê wî dema dixwaze ku tiştа dîtiye terîf bike, dibêje, "Ji nişkê ve weke şûrekî ji dîwêr kete hundir. Min xwest ez wê bigirim, lê belê di nava hundir de weke mijê belav bû. Dema min bi çavê xwe ew şopand, çavê min şewitandin. Ewqas diçewisî ku li pişt dîwarê ku lê diket sî çêdikir. Lê piştî demekê wenda bû. Lê diyar bû ku ji derve hatibû. Ew çi bû?"

Mamosteyê wî rewşê dizane û rûsipiyan agahdar dike. Dibêje, "Eger em bi derbekê re ji Mîrza re qala dinyaya derve bikin, ew ê hişê xwe ji dest bide û bibe mecnûn. Ew ê tiştan bi xe ber lêpirsînê, bê ka çima ji bo perwerdeyê hatiye hepskirin. Di vê mijarê de herkes sûcdar e."

Ji ber vê yekê di bernameyê de guhertinê çêdikin û qonax bi qonax her roj perwerdeya ronahiyê didine. Ev pêvajo dibê weke çîroka sîtavkê. Çîrok, weke hundirê makîneyeke wênegiriyê ya dijî îfade dike. Wê kêliya ku dixwaze ronahiyê bigire, bandor li min kir. Fotograf, berhema wê kêliyê û wî fikrî ye. Ev çîroka ku berovajî îdeaya şikeftê ya Platon e, li cihekî zanyariya derbarê ronahiyê de îfade dike. Heger em cîh, weke şêwazê demê ya firehbûyî bi nav bikin, fotograf ew çarçika demê ya kêliyên girtî ye. Rêwîtî, rêwîtiyeke di demê de ye. Rewşên ku ji şêwazên fotografan yên di demê de çêdibin, çîrokên xwe jî ji berê ve tînin.

Cenabê te reng û ronahiyê çawa bi kar tîne?

Di çanda Çînê de li dijberê reş, ne spî, sor heye. Ango reng bi şêwazê otantîk, statîk nîne. Dema reng, di spektrûma prîzmatîk de ji rengê vekirî, ber bi rengê tarî vê diherike, şemayeke dagirtî derdikeve holê. Bi pirranî rengên mat dibijêrim. Weke çîroka sîtavkê, bi şêwazê arkeolojiyê li ronahiyê dinihêrim û ev bi demê re diyarker dibe.

> Çîroka Sîtavkê: Ji nişkê ve weke şûrekî ji dîwêr kete hundir. Min xwest ez wê bigirim, lê belê di nava hundir de weke mijê belav bû. Dema min bi çavê xwe ew şopand, çavê min şewitandin. Ewqas diçewisî ku li pişt dîwarê ku lê diket sî çêdikir. Lê piştî demekê wenda bû. Lê diyar bû ku ji derve hatibû. Ew çi bû?
>
> Wê kêliya ku dixwaze ronahiyê bigire, bandor li min kir. Fotograf, berhema wê kêliyê û wî fikrî ye. Ev çîroka ku berovajî îdeaya şikeftê ya Platon e, li cihekî zanyariya derbarê ronahiyê de îfade dike. Heger em cîh, weke şêwazê demê ya firehbûyî bi nav bikin, fotograf ew çarçika demê ya kêliyên girtî ye.

www.arsivakurd.org

# Min ji ronahiya ezmanî sîtavk dizî

Bi fotografan bi insanan re, bi xeyalên wan, dîroka wan, hêviyên wan û bi çandên wan re ez dikarim bêhtir elaqedar bibim û ez dixwazim wan bi temamî weke rastiya wan îfade bikin.

www.arsivakurd.org

***Cenabê te bêhtir fotografên insan yan jî xwezayê digire? Van mijarên di fotografan de cenabê te çima û çawa dibijêre?***

Ya rastî, ez li ser her du mijaran jî bi pirranî kar dikim. Lê belê dema ez portreyekî insanekî bigirim, ev ji bo min hinekî taybettir e. Ez weha bibêjim; bi fotografan bi insanan re, bi xeyalên wan, dîroka wan, hêviyên wan û bi çandên wan re ez dikarim bêhtir elaqedar bibim û ez dixwazim wan bi temamî weke rastiya wan îfade bikin. Çîrokeke ku nivîskarek der barê jiyana gundekî de nivîsandiye, ez li wî gundî dijîm, û wê bi fotografan îfade dikim. Bi vê yekê tevî ku ez li pişt kadrajê me jî, bi awayekî di nav wê çarçika fotografê de ez cihê xwe digirim. Bi kurtasî, dema ez bi wan insanên fotografê re wê kêliyê parve dikim, dibim mêvanê jiyana wan, ew fotografên ku min ew girtine ji bo min dibin taybet.

***Wer xuya dike ku di fotografên xwe de hun girîngiyeke taybet didin Serhedê, pirranî jî Bazidê; çima Serhed û Bazid?***

Hêmaneke sereke ew e ku ev erdên li wan hatime dinê ne. Serhed herêmeke ku ez xwezaya wê, mirovên wê pirr baş nas dikim, aramiyê dixe nava dilê min. Herçî Bazîd e, cihekî weha ye ku ewqasî di nava kezeba min de cihê xwe girtiye ku di rêwîtiyên dûr de timî çavên min li çiyayên wê digerin. Ez hez dikim newaya dostane ya çayê îkram dike ya dengekî ez nas nakim, bibihîsim. Dema ku ez ji Bazîdê vediqetim, silbûn û dûrbûna xwe bi ecêban dide hîskirin. Ez parçeyekî Bazîdê me û Bazîd jî parçeyekî min e.

***Tevî ku cenabê te Kurd e, tu dibêjî, tu bi zimanê xwe yê dayikê zêde nizanî. Elaqedarî vê rewşê hunerê fotografê û wênegirî ji bo te çi îfade dikin?***

Dibêjin, dil çawa be, nefes jî weha bêhnê dide. Cografyaya ku em lê jiyane, bi tena serê xwe ne qedera me ye, lê belê bi hin aliyan jî qedera me ye. Ziman, deng û awaza çandê ye. Li zozanan bi hozanan, qesran jî bi dengbêjan xwe îfade dikir. Lê êdî li ser van erdan roj weke berê roniyê venade. Weke berê dîwan û malê gundan yên civatê jî nînin. Me jî çav berda televîzyonê û ew kursiyê rûniştine. Kêmzanîna Kurdiya min di serdema jenerasyona min de tenê pirsgirêka min bû, lê belê êdî di nifşê nû de weke pirgirêkeke giştî derdikeve pêşberî me. Min bi wêneyan ev pirsgirêka xwe îfade kir. Belkî ev ji bo min çareseriyek bû, lê belê ji bo nifşê nû êdî nikare bibe çareseriyek. Berovajî vê, ji ber ku min nikarîbû zimanê xwe ji qirika xwe derînim, min ji ronahiya ezmanî sîtavk dizî û min xwe îfade kir. Ji ber quhê min elimiyê vî zimanî bû, pirsgirêka min a fêmkirina wî nebû. Di encamê de şensê min hebû ku ez vê bi fotografan bînim zimên. Lê pirsgirêka nifşê nû, gelekî girantir e û pirsgirêkeke cidî ya civakî ji bi xwe re tîne. Belkî em karibin tiştekî ku şexsî be bi huner îfade bikin, lê pirsgirêkeke civakî ancex em dikarin bi awayekî çandî çareser bikin. Mixabin plansaziyeke me ya çandî ya bi vî rengî nîne. Gelek sedemên vê hene û belkî ji ev yek ewqasî zehmetiyê ji me re çêdike.

***Cenabê te di fotografan de çiqasî cîh dide hestên di rû de? Kîjan awirên di rû de pirranî bandora xwe li ser fotografên te dike, bi te didin hîskirin?***

Hezn û xemgînî, dihêle ku ji ken gelekî zêdetir masûlkên rû werin bikaranîn. Hetta em dikarin bibêjin ku sê caran zêdetir. Dibêjin, qermîçokên di rûye pîr yan jî kalekî de kêlên tirbê yên êvîne ne. Ev nîşaneyên di rû de weke ferhenga xeyalên şikestî, êş, kêfxweşî, jan, gazincan, kelecanan, hêviyan heta hemû peyvên di zimên de ne. Dibe ku ji ber evqas eşkere û tazî ne, li gelek aliyên cihanê me maske vedîtine, li Rojhilata Navîn jî rûpoş. Ji ber ku ji bo milê şikestî, milê kirasekî jî hebû. Ji bo rû jî pêdivî bi rûpoşê hat dîtin. Li dewsa ku insan bê rû be, veşartina rûy êdî bû adab û exlaqek. Rûpoş dewsa berçemê girt. Rû, ew derî ye ku li derûnê insên vedibe. Hezar rûye jiyanê hene. Di vê çarçoveyê de bawer dikim ku qermîçonkên di rû de rastî jî kêla gora tevahiya jiyanê ye.

***Serhad û zozan hema bibêje tim bi hev re tên bîra mirova van; zozan, keriyên pez, şivan, cenabê te van çawa di kadraja xwe de bi cih dike?***

Di fotografan de em beşeke gelekî hindik ê zozanan û jiyana li wir dibînin. Dema fotografan digirim, heta ji destê min tê ez hewl didim ku insan û xwezayê, her weha ew jiyana ku ew tê de cih digirin, weke rastiya wê bixim kadrajê û kompozîsyoneke ji rastiyê dûr çênekim.

***Cenabê te dikare behsa bîranîneke xwe ya dema wênegirtinê de bike?***

Di rastiyê de bersîva vê pirsê gelekî zehmet e. Ji ber ku dema ji fetlînokan derbas dibe av kef dide. Û insan jî bi demê re di bin bandora çîrokên paşê yên hin fotografan de dimîne. Ev tişt, mijarek e ku zêde nikare bête nivîsandin, ji ber vê yekê ez fotografê hildibijêrim. Lê ez dikarim ji bo vê yekê, tişta ku min di pirsekê de behsê kir, weke mînakeke bidim; di pîrozbahiyeke Newrozê de dema bi makîneya xwe ya fotografan daketim qada Newrozê, rastî êrîşekê hatim. Bi alîkariya hevalên min yên li qadê berpirsyar bûn, beyî ku birîndar bibim min ev bela li pey xwe hişt. Ji ber ku fotograf piştî ku weke delîl tê bikaranîn, ji ber binpêkirina mafan ya elaqedarî vê yekê, nerazîbûna insanan gelekî zêde bûbû. Xelkê li meydana Newrozê, nerazîbûneke ecêb û gelekî hişk nîşanî wênegir û makîneya fotografê dabû. Êdî dem guherîbû. Ji bo desthilatdaran her rê û rêbaz rêwa bû. Fotograf jî delîlê herî mezin yê berbiçav bû. Deklanşor êdî ne bêguneh bû. Insan êdî tirsiyabûn û dest bi êrîşê kiribûn.

***Cenabê te di heman demê de çiyagerek e jî. Tu dikarî hinekî behsa vê jî bikî? Heta niha tu hilkişiyayî serê çend çiyayan? Herî zêde tu dixwazî hilkişî serê kîjan çiyayan?***

Biranîneke min a destpêkê ku ji zoraktiya min ve tê bîra min ew bû ku, dema bi hevalê xwe yê herî nêz me li Araratê têmaşe dikir, min got, "Ez ê rojekê biçim serê çiyayê Araratê û ji wir, li vî girê ku em lê ne binihêrim." Bi salan min li Araratê temaşe kir, lê hîç ez hilnekişiyam serê. Lê ti carî ez nefikirîbûm ku rojekê ez ê biçim serê çiyayan û vî weke pîşeyekî bikim. Di destpêka salên 2000´î de tesadufek rast hat û ez hilkişiyam serê Araratê. Cara yekem bû ku ez hilkişiyam serê çiyayekî, sertarekê. Lê belê ji ber em di bahozê de hilkişiyabûn û rewşa hewayê ne baş bû, min firsend nedît ku ji serê çiyê li deştê binihêrim. Di hilkişandina min a serê çiyê ya li pey ve de ew xeyala min bi cîh hat û di hewayeke xweş de min ew xeyala xwe ya zarokatiyê pêk anî. Her hilkişandina serê çiyê ku min digot, êdî ev ya dawî ye, hilkişandineke din a serê çiyê li pey xwe anî û bi dehan caran ez çûm serê çiyayê Araratê. Piştî wê, min organîzasyonên hilkişîna serê çiyê pêk anîn û gelek çiyagerên biyanî min birin serê çiyayên Ararat, Suphan û Kaçkarê. Di salên dawî de Ararat li hilkişandinê hat girtin û hejmara turîstên ku tên çiyê jî gelekî kêm bû. Ji ber vê yekê min jî dest bi karekî din kir. Ez hêvî dikim ku di demeke kin de wê çiya azad bibin û em ê karibin bi çavên çiyayan dîsa deştê temaşe bikin.



Bûk û bizin

Ev wêneyek e ku ji ber ceribandineke me ya amator a çêkirina filmekî maye. Me xwestibû jinên ciwan ên ku nedixwestin bizewicin lê bi zora malbata xwe dihatin zewicandin bi kurtefilmekê bi awayekî tesîrker îfade bikin û me xwe li ceribandineke piçûk a çêkirina filmekê qewimand. Dema ku me bûkanî kirê kir, jina dikandar ji me pirsî ka ji bo çi ye. Piştî ku bi mebesta me hisiya, nexwest pereyan ji me bistîne; got, hûn ji bo jinan karekî dikin, ma dibe ku ez mesrefê ji we re derxim. Vê yekê- gelekî tesîr li me kiribû. Me kembera bûkê sor hişt weke nîşana dîl û girtîbûnê. Kesê dixwaze dikare li navnîşana li jêr li filmê temaşe bike:
**https://www.youtube.com/watch?v=OqcRHttT_EQ**

## Zarokên dibistana seretayî û çiyayekî din



Di dema xwepêşandaneke li meydana şaredariya Bazîdê de dibistanekê li meydanê dinihêrî. Zarokan bang li min kir, ez çûm û me henek li hev kirin, paşê jî min ev wêne girt. Piştî vê bi salan min li kafeyeke li Bazîdê deh wêneyên xwe ji bo pêşangehê daliqandin. Bi vî rengî hem mirovan çaya xwe vexwar û hem jî bêyî ku haya wan ji wan hebe, li pêşangehekê geriyan. Rojekê min dît ku ciwanekî 17 salî li ber vî fotografî sekinî û bi dûvdirêjî li wêne hûr nihêrî. Ez çûm cemê, min got, te di wêne de xwe dît. Wî got, erê. Lê ne bextewer bû, bêhtir xemgîn bû. Ji min re got, binihêre, ha ev ez im, ev jî hevalê min e, çû çiyê. Ez nizanim gelo sax e yan na...

## Gulîzer û kurê wê



Gulîzera 'Dîn', kurê wê ew li erebokekê siwar kiriye û dibe malê. Piştî ku aqlê Gulîzerê ji serê wê diçe, mêrê wê, wê diterikîne. Êdî ji kolanan dimîne û gelek caran rastî êrîşên cinsî tê. Di encama van destavêtinan de zarok jî jê re çê dibin. Xelkê navçeyê wê baş nas dike, jin jî ihtîramê jê re digirin. Jinan îkram didan wê, ew dikir mêvan, ew dişûşt û porê wê şe dikir. Gulîzer êdî ne sax e, lê belê çîrok û serhatiyên wê tên gotin.

## Jinên Roja Jinan a Cîhanê



Ev wêne di çalakiya bi rasthatina Roja Jinan a Cîhanê a li Bazîdê hat girtin. Di wêne de mirov dibîne ku du hevalên hev ên bi cilûbergên gelêrî, hem bi cilûbergên xwe û hem jî bi sekna xwe ji qelebalixa li dora xwe vediqetin.

www.arsivakurd.org




www.arsivakurd.org

# Di navbera bîr, merasîm û kêliya fotograf de HUNER

▶ Ebrahîm ELÎPOOR

Di navbera wêne û bîrê de têkiliyeke xurt heye, bi wî rengî u mekan û kêliya di bîrê de di fotograf de dicemidin. Di bîrê de dewra rîtuelan jî di nava civakê de gelek e. Gelek tiştên civakî xwe bi bîrê bi cih dikin, bi saya tesîra dîmen, kelecan û kêferata rîtuelan. Li Kurdistanê gelek komên civakî, etnîk, lînguîstîk, dînî û mezhebî hene ku bi rîtuelên cûr bi cûr xwe di nava bîra civakî ya komên xwe de bi cih kirine. Di warê rîtuelan de hem di warê mekan û hem jî diwarê pirrengiya merasîmî de Hewraman ne tenê ji bo Kurdan ji bo gelek wênegiran bûye mekanekî ku mirovan ber bi xwe bikişîne. Lê belê fotografên wênegirê Kurd ê ciwan Îbrahîm Elîpûr (Ebrahim Alipoor) ê ji Rojhilatê Kurdistanê di vî warî de bê guman di warê serketîbûna zeftkirina kêliyê de serketî ne. Elîpûr ji PolîtîkArtê re behsa wênegiriya xwe û yekê ji van rîtuelên Hewramanê dike ku li gundê Hewramê Text bi navê Merasîma Pîr Şalyar bi rê ve diçe.

### Pîrê Şalyar li Hewramanî Text

Marasîmên Pîr Şalyar li gundê Hewramanî Text bi rê ve diçin ku li Rojhilatê Kurdistanê ye. Ev Merasîm li dora fîgurê destanwarî, efsanewî yê bi navê Pîrê Şalyar digerin. Li gorî rîwayetê ew rahibekî Zerdeştî bûye, ku li deverê bi cih bûye û dînê xwe li wir belav kiriye.

Ev merasîm ku cejneke sê rojî ye, li dawiya çilê zivistanê tê pîrozkirin ango di nîvê meha sibatê de. Ev cejn li gorî rîwayetê ji bo bibîranîna salvegera daweta ji bo zewaca Pîrê Şalyar bi Behar Xatûnê re ye ku keça Hakimê Buxarayê ye. Ev keç kerr û lal ji dayika xwe bûye.Pîrê Şalyar jî bi mûcîzeyeke îlahî li gorî rîwayetê ew baş kiriye. Paşê jî bi wê re zewiciye.

Mala Pîrê Şalyar li Hewramanî Text navenda merasîman pêk tîne, hem di warê mekanî de û hem jî di warê rîtuelî de. Di vî karê min yê fotografgiriyê de gelek merasîmên qurbankirina heywanan hene, çêkirina şîrînahiyan û xwarinên taybet û kilorên piçûk ên nên heye, xwarina ziyafetê heye, helbest xwendin, çêkirina mûzîkê û semahên ku mirov dikare ji wan re zikra dînî bibêje hene.

### Merasîm û terîqeta Qadiriyan

Li gorî Prof. Dr. Philip. G. Kreyenbroek elaqeya merasîman û vê cejnê mihtemelen bi terîqeta Qadriyan re heye; Pîrê Şalyar her weha li cem Yarsanên Kurdistanî jî pîroz û ew weke fîgurekî xwedayî tê hebandin. Lê belê Yarsan di vê cejnê de qet cihê xwe nagirin û beşdar nabin.

### Ji bo çi Pîrê Şalyar?

Sala min a yekem bû ku min dest bi wênegiriyê kiribû û min çavên xwe li Kurdistanê digerandin da ku li welatê xwe mijarên baş peyde bikim.

Ji dema min dest bi vê projeyê kir û vir ve, gelek rêûresm û detayên di wêneyên min de belgekirî, hatin texrîbkirin yan jî ji bîrê hatin birin; hatin jibîrkirin. Ji ber vê sedemê jî aliyekî din ê wêneyên min ew e ku di nava dîrokê de belgeyekê bi gewde bikin.




Min der barê Pîrê Şalyar de bihîstibûn hin tişt û xwendibû jî ku digotin ew yek ji kevintirîn merasîmên Kurdistanê ye. Ez bûm aşiqê xelkê Hewramanê û vê merasîmê. Pê re jî min dest pê kir wêneyên wê bigirim; bi beriya bi 7 salan ve min wêneyên vê merasîmê digirtin. Min par pitûkeke wêneyan a li ser vê merasîma Pîr Şalyar a 85 rûpelî weşand.

### Rengên reş û spî

Tevahiya wêneyên di vê albûmê de ku ez behsa wan dikim, ên merasîma Pîrê Şalyar, reş û spî ne. Çawa ku Ted Grant dibêje, "Dema ku mirov wêneyê mirovan bi rengan digire digire, mirov wêneyê cilûbergên wan digire. Lê dema ku mirov wêneyên wan bi rengên reş û spî digire, hingê mirov wêneyê ruhê wan digire!"




### Parastina ruhê çand û merasîmê

Ji bo wêneyên min jî ev rast e. Ez wênegirekî belgeker im, ji ber wê jî ez hewl didim ruhê mirovan û tiştan bi wêneyan bigirim. Ji bo min nexasim jî di projeya Pîrê Şalyar de ev veguhertineke her sal bû ji be rgelek sedemên cihê. Ji ber vê bi wêne belgekirin û parastina çandê û ruhê merasîmê gelekî girîng e. Ji dema min dest bi vê projeyê kir û vir ve, gelek rêûresm û detayên di wêneyên min de belgekirî, hatin texrîbkirin yan jî ji bîrê hatin birin; hatin jibîrkirin. Ji ber vê sedemê jî aliyekî din ê wêneyên min ew e ku di nava dîrokê de belgeyekê bi gewde bikin. Ez hewl didim tiştan mihafeze bikin, wan bigihînim mirovên din û nifşên piştî me.

Mala Pîrê Şalyar li Hewramanî Text navenda merasîman pêk tîne, hem di warê mekanî de û hem jî di warê rîtuelî de. Di vî karê min yê fotografgiriyê de gelek merasîmên qurbankirina heywanan hene, çêkirina şîrînahiyan û xwarinên taybet û kilorên piçûk ên nên heye, xwarina ziyafetê heye, helbest xwendin, çêkirina mûzîkê û semahên ku mirov dikare ji wan re zikra dînî bibêje hene.

# Ciwanekî behremend
# Ebrahim Alipoor

Îbrahîm Elîpûr (Ebrahim Alipoor) 4´ê Îlona 1989´an li bajarê Rojhilatê Kurdistanê Baneyê tê dinê. Ji sala 2009 ta 2012´an li zanîngeha Payamê Nûr a li Bokanê xwend lîsansa xwe ya mîmariyê temam kir.

Ew di heman demê de grafîker û dîzaynkerê filmê Mulct e ku sala 2014´an Mehdî Xelîlî derhêneriya wî kir.

Di warê wênegiriya filman de jî serketî ye û ji bo filmên li jêr xebitiye:

- "Natamam be sheddatê harçê tamamtar", 2015, bi derhêneriya Azad Mohammadi
- "Fall's Guest", 2014, bi derhêneriya Nazir Mirzaei
- "Black And White", 2014, bi derhêneriya Jalal Saedpanah
- "Identity", 2013, bi derhêneriya Towfigh Amani
- Belgefilma "Kurdish Handmade Carpet (Berên bi destan çêkirî yên Kurdî)", 2013, bi derhêneriya Kaveh Kiyani
- "Shutter", 2012, bi derhêneriya Farzad Hassanmirzaei
- "Kurdistan State Cultural Package", 2012, yê dayî çêkirin Iranian Cultural Heritage Organization (Rêxistina Mîrateya Çandî ya Îranê)

### Bi pêşangehan serketî

Îbrahîn Elîpoor di warê wênegiriyê de ewqasî serketiye ku di demeke kurt de dest bi organîzekirina pêşangehên xwe yên solo dike. Ya pêşî jî li bajarê Bokanê dike bi navê "Belgekariya Civakî" li zanîngeha Peyamê Nûr sala 2012´an. Bi navê "Koleksiyona Çanda Kurd" sala 2014´an pêşangehê li Baneyê li dar dixe. Pêşangeha bi navê "Antropolojiya Kurdistanê" sala 2013´an li Slovenyayê bi rê ve diçe. Li bajarê Bokanê sala 2013´an jî pêşangehêkê vedike bi navê "Wênegiriya Xwezayê". Li muzexaneya Tebrîzê pêşangeha fotografên "Berên bi desta çêkirî" vedike. Hin ji van pêşangehan li bajarên Tehran, Sarî, Baneh du carî tên vekirin.

### Her xelat wergirtine

Bi xebata xwe ya wênegiriyê Elîpûr hêjayî gelek xelatan hatiye dîtin. Li Slovenyayê sala 2015´an di beşa di geştyariyê de xelata zêrîn wergirt di Slovenia Fotostrom Festival de. Wekî din xelata MCPF sala 2015´an di 66. "International Exhibition of Photography" a Midland Salon wergirt. Wekî din ji aliyê gelek tercîh û pêşbirk û festîvalên li Hindistanê, Bengal, Ingilistanê û gelek welatên Dinyayê xelat wergirtin. Li Îranê yek ji wênegirên herî serketî yên ciwan tê qebûlkirin û bi dehan xelatên di warê wêneyê de wergirtine.



www.arsivakurd.org

# Dîroka Bêxwedî Qeremanî



❑ Em ji fermaneke Osmaniyan dizanin ku Canbegên li bakurê Kurdistanê beşek ji Qeremanan e û parçê wan e ku neçûnê Xorasanê.

**Şoreş REŞÎ**

Li bakur an jî li seranserî Kurdistanê ez ti caran li rastî êlêke bi navê Qeremanî nehatim. Tenê Tirk di dîroka xwe de qala 'Karamanoğulları' yanî kurên Qeremanan dikin û wan wek Tirk nîşan didin. Lê di rastiye de Qeremaniyan, li bajarê Karaman a li başûrê Anadolê dewleteke bi vî navî damezirandine û gelek avahiyên dîrokî li dû xwe hiştine. Di salên 2001 û 2003'an de dema ez çûm Xorasanê, li bajarê Aşxanê li rastî Qeremaniyên koçber hatim. Di nava xelkê de û di pirtûkên Farisî de ev wek "Taîfa Qeremanlû" derbas dibe. Ew daçek a "lû" ya li dawîya navê wan, wek ku Tirkiye jî nîşan dide, ew ji Anadolê çûne. Bajarê Karaman navê xwe ji vê êla Kurd girtiyê. Ew kîngê û çawa bûyê? Ez ê hewl bidim ku bersiva van pirsan bidim.

### Navê Qereman?

Peyva Qereman ji Erebî tê, Tirk jî vê bi kar tînin û ev peyv ketiye nava Kurdî jî; di zimanê me de bi pirranî di wateya mêrxas, egîd û bêtirs de tê bikaranîn. Bi vê ve girêdayî, hinek jêderên Ereban jî dest nîşan dikin ku ew vê yekê li mirovên bêtirs re dibêjin. Hinek nûserên Tirk jî îdea dikin ku Qeremaniyan ji ocaxên komirê, komir dianîne Ermenek-Qonya û ji bo rû û kincên wan reş dibûn, ji wan re gotine Qereman (mêrê reş). Lê ya herî rast ji aliyê Prof. Uzunçarşili ve te nivîsîn. Ew dibêje, "Sala 1228'an serokê êla Qeremaniyan Nûrê kurê Sadûddîn (Nûrê Sofî) e û kurê wî jî Kerîmûddîn Qereman e (?-1261). Qeremanîyan navê xwe ji êla bi navê Qereman girtiye."

Wekî em dizanin ku pirraniya êlên Kurd navê xwe ji serokekî yan jî ji cihekî digirin. Îhtîmalek heye ku di vê serdêmê de komê dev ji navê xwe yê kevin berdabe û navê nû yanî Qeremanî ji xwe re girtibe. Prof. Faruk Sumer jî ve yekê tîne ziman: "Kurê Nûreddîn Sofî Qereman navê xwe da malbatê. Em dizanin ku pirraniya serokên Qeremaniyan ji Bexdilî yan jî ji Şamlûyan (Dulkadirî ne) derketine."

### Dîroka Qeremanîyan a kevin

Li gorî jêderên heta roja îro derketine holê dest nîşan dibe ku, warê Qeremaniyan ji berê de Xorasan a mezin bûye. Dibe ku di nava Xorasanê de koçber bûn yan jî bi zora hêzên din cihê xwe guherîbin. Lewre ew carinan li dora Gola Baykal, carinan li Hîwe û carinan jî li Mangişlak (rojhilatê deryaya Kesk/Xezer) xûya dikin.

Dîrokzanê Tirk, Sumer, ji "Şecerî Terakîmê" radigihîne ku, "Oxuz, ji sedsala 10'an bi vir de li Mangişlak (rojhilatê Behra Kesk-Xezer) dijîn. Ew, bere giredayî xanê Altinorduyê; paşê jî giredayî xanê Salur e û li Hîwe daniştine. Piştî Şah Melîk mir, Oxuz belav bûn û beşek ji wan çû Mangişlak. Serokên wan, Kîlîk, Kazan û Qereman bûn. Pirraniya wan ji êlên mîna; Eymûr, Doger, Igdir, Çavuldur, Karkin, Salur û Axar bûne. Osmanî van êlan demekê wek Ûç-Ok, piştre jî wek Boz-Ulus jî binav dikin. Salurên li Mangişlak du beş bûn: Yen hundir û yên ji derve. Di ss XVI´an de ji Salûran, Yamut, Ersari, Teke (milan) û Sarik derketin. Vana sala 1863'an, 196 500 kon bûn (A. Vanbery). Bi êrîşên Mangit û Kalmukan ew çûn Xorasan û Balhanê." Uzunçarşili jî xaleke din a balkêş radigihîne: "Ji vê êlê beşekê em di nava sedsala 12'an an de li Mevaraûnnehr û beşeke din jî em di dema Beranî avabûn de li Ezerbeycanê dibînin."

### Hatina Anadolê

Sumer, li ser hatina Qeremaniyan a Anadolê dibêje, "Ew bere hatin Genc û Berda. Bi hatina Moxolan re hatin Sêwasê."

Li wir beşdarî serhildana Bav Îsheq bûn û piştre ji çûn dora Ermenekê (Qonya).

Ûzûnçarşili jî dibêje, "Beşek jê sala 1228'an - serdema Alaaddîn Keykûbat I. e - li Ermenakê bi cih bûn. Kerîmûddîn Qereman (?-1261) Ermenak heynan û bi şûn ve navê bajêr kir Kamerûddîn.

Dîrokzanê Tirk Yazicioglu jî vê yekê misoger dike: "Qereman ji Avşaran in. Li gorî dîroka Ermenan a anonîm a ji sala 1300'î ve mayî, serokê Avşar, Îslam Beg, sala 1254'an li peravê Îsorya bajarê Cracca (Kiz Kulesi- Silifke/Mersîn) talan kir." Uzunçarşili jî dibêje, "Sala 1261'an Qereman Beg bi birayê xwe Bumsuz û Zeynelhec ve êrîşî ser Selçûqiyan dike. Piştî şerekî xwînrij Qeremanî têk çûn, Bumsûz û Zeynelhac dîl ketin û hatin bi dar ve kirin."

Heman salê Qereman dimire. Kurê wî yê mezin Şejmseddûn Mehmed dikeve şûna wî.

### Mêrxasiya Qeremanan

Sala 1276'an Moxol û Selçûqî dibin yek û êrîşî Qeremaniyan dikin. Di şerê li derbenda Goksu de hêzên îttîfaqê li hember Qeremaniyan têk diçin.

Sala 1277'an Qeremaniyan bajarê Qonya dorpeç kir. Piştî şerên direj, Qonya teslîm bû lê xelkê desthilatdariya Qeremaniyan nepejirand. Bi ser wê de Memed Begê Qereman kurê Izzedîn, Giyasuddîn Siyavuş (Cimri) Selçûqî kire rêveber. Bi ser hatina Moxolan re, Memed Beg vedikişe Mersînê. Heman salê Memed Beg di şer de ji aliyê Moxolan ve hat kuştin.

Gazan Xanê Moxolî ji bo mêrxasiya Qeremanan dibêje, "Heger ew Tirkmen û Qeremanî nebûyana, hespên Moxolan heta cihê ku roj lê diçe ava, dê biçûyana."

### Dewleta Qeremanî (1256-1487)

Jêderên Tirk dibêjin, Qeremanî ji sala 1327'an heta 1417'an serbixwe bûn. Beriya salên 1327´am giredayî Selçûqiyan nîşan didin. Lê mêriv dikare bibêje, bi hatina wan a Ermenakê (1228) re dewlet damezirandine. Piştî salên 1487'an mirov dibîne ku carinan ketine bin destê Memlûkan, Osmaniyan, Tîmûr û Pezgewran.

Şahabeddîn Omerî dibêje, "Zagonên Qeremaniyan bêhempa bûn, defterên xwe yên erdê; 25 hezar siwarî, 25 hezar jî eskerên xwe yên piyade hebûn. Ji xeynî wan jî ji hêzên êlan jî sûd werdigirtin."

### Têkoşîna li hember Osmaniyan

Di wê serdemê de, yek ji dewletên din ên li Anadolê hatî damezirandin jî Osmanî bûn. Di serdema Yildirim Beyazit de wan êrîşî mîrekiyên Kurdan ên mîna Aydin, Menteş, Germiyan, Sarûxan kir û di dawiyê de jî çû ser Qeremaniyan. Têkoşîna Qeremaniyan a li hemberî firehbûna Osmaniyan her dewam kir û li deşta Qonyayê, sala 1387'an ew têk birin. Alaaddîn Begê Qeremanî, dema Yildirim li Rumeliyê bû êrîşî Enqerê kir û ew der girt. Bi ser vê de Bayezît jî êrîşî Qeremanan kir. Şiltberger ê li cem Bayezit wiha qala şer dike, "Yildirim bi 160 hezar leşker çû ser wan. Qeremanî jî 70 hezar bûn. Li Qonyayê şer kirin lê herdû alî jî bi serneketin. Paşê, Osmaniyan bi dizîka 30 hezar leşkerên xwe şandin pişta Alaaddîn û ew têk birin. Wî, xwe sparte keleha Qonyayê, dema Yildirim kete nava kelehê wî êrîşî Yildirim kir. Heger xelkê kelehê alîkariya wî kiribûya, ew bi ser diket, lê nekirin lewma ew dîl ket û Yildirim serê wî jêkir."

Bi vî awayî sala 1398'an dawî li Qeremaniyên Qonyayê hat. Li Mût, Ermenek, Îçel û Taşelî desthilatdariya Qeremaniyan bi Şêx Hesen dewam kir. Di dema Tîmûr de girêdayî wî Qeremaniyan dîsa desthilatdariya xwe bi dest xist. Pişt re gelek caran ketin bin parastina Memlûkan.

Di salên 1442'an de em dibînin ku Îbrahîm Begê Qeremanî bi Xaçperestan re, li hemberî Osmaniyan dikeve îttîfaqê û bi ve re Enqere, Kutahya, Afyon, Bolvadin, Beypazari, Hamideli tên şewitandin.(2) Siltan Murat bi Xaçperestan re aştiyê dike û hemû tola xwe ji Qeremaniyan dihilîne. Cîhên ku tê re derbas dibe, kevir li ser kevir nahêle û bi tevî leşkerên xwe dest dirêjiya jinan dike. Ji Qeremaniyan re Akşehîr, Seydîşehîr, Beyşehrî dimînin (2). →

**Belaya serê Osmaniyan bûn**

Li Anadolê ji bo Osmaniyan pirsgirêka mayî Qeremanî bûn. Pêwîst bû ji bo wan çareyekê bibînin. Lê ew pirsgirêk bû sedem ku Osmanî bi Hesenê Dirêj-hakîmê Îranê- re bêne hember hev. Desthilatdariya Qeremanî ya li navenda Anadolê sala 1468'an dawî lê hat. Lê têkoşîna begên Qeremanan li Torosan hîna jî dewam bû. Ew yek bû sedema nexweşiya di navbera Memlûk û Osmaniyan de jî. Sala 1472'an artêşa Qereman û Pezgewran Tokat bi erdê re kirin yek û dûvre, êrîşî Akşehîrê kirin. Pezgewran, ji Pîr Ehmed û birayê wî yê Qeremanî re, di fermandariya Zeynel Beg de artêşeke ji 30 hezar kesan pêkhatî şand. Lê sala 1472'yan Osmanî di şer de bi serketin.

**Parçebûna Qeremanîyan**

Di serdema Pezgewran de navê du komên Qeremanî derbas dibe. Di vir de parçebûnek heye, lê em nizanin sedêma wê parçebûne çi ye. Ji bo komekê ji wan herî dawî navê Qasim Begê Qeremanî sala 1478'an derbas dibe.

Koma duyemîn jî ji destpêka sedsala 15'an ve, li Berda-Gêncê bi cih bûyî ye ku endamên wê neviyê Emîr Qereman in. Li wir tevlî Şah Îsmaîl bûne.

Di dema Şah Îsmaîl de ew li Aranê dijîn. Ji begê wê êlê Beyrem, Xorasan girt û piştre bû waliyê eyaleta ku Belx, Murxab û Gurcistan di nav de ye. Ew sala 1512'an di şerê Ozbekan de mir.

**Têsîra li ser damezrandina Safewiyan**

Di serdema dewleta Safewiyan de, pirraniya Qeremaniyan gihiştin Şah Ebbas û bûne xwedî statu. Yek ji kesên herî binavûdeng ê wê demê Biram Begê Qeremanî bûye ku bi xwîşka Şah Ebbas re zewiciye. Lewra yek ji komên hêza Safewî damezirandî Qeremanî bi xwe ne. Eger Qeremanî û hêzên din ên Kurd nebûyana Safewî jî, Şah Ebbas jî dernediketin holê. Li ser milê wan, Safewiyan hêz kom kir û bûne xwedî dewleteke mezin. Biram Beg, Xorasan ji destê dagirkerên Ozbek rizgar kir û tixûbên berê yên Xorasanê careke din xêz kir û dest danî ser Herat û Belxê. Sala 967'an, ji ber mêrxasî û netirsiya xwe heta nav dilê dijmin çûbû lê di vî şerî de tê kuştin. Wekî din mirov dikare qala Zolfeqarxanê Qereman bike ku di îdarekirina welêt de, 133 salan piştî Şah, wek kesê herî bi hêz û xwedî desthilat bû. Di dema Şah Ebbasê yekem de li cihê herî bilind bû. Lê dûvre bi destê Şah hate kuştin. Ji ber ku Şah ji hebûna wan ditirsiya ev yek kir. Îro li Xorasanê Kurdên herî xas ew in û hîna jî rêûresmên Kurdî didomînin.

Li Xorasanê, Qereman li bin çiyayê Şaycanê û li dora bajarê Aşxanê dijîn. Beşên Qeremanan wek êlên; Mayvan, Îgan, Qasiman, Şadkan û Heşt Merxî xûya dikin.

**Qeremanyên li navênda Anadolê**

Em ji fermaneke Osmaniyan dizanin ku Canbegên li bakurê Kurdistanê beşek ji Qeremanan e û parçê wan e ku neçûnê Xorasanê. Ferman wiha ye: "Ji Begê Enqere û ji Qadiyên li wê herême re! Te ji min re name şandiye, ku Canbegê ji taîfa Qeremanlû yê di nav sînorên Aksaray û Enqere de; û Bozcalû yê ji taîfa Haymana diziyê dikin. Bazirgan, rêwî û gelên wir dişêlînin û mirovan dikujin. Gelek êl in, ji ber ku li wir niştecih in, neçin ser. Lê dema ev ferman gihişte destên te, here ser wan û wan bixe dest. Yên ku ev karên xerab nekirine, dest nedin wan. Sal 998 (mîladî 1585)."

Ji vê fermanê bi awayekî zelal diyar e ku Canbeg girêdayî Qeremaniyan in û hîna jî ew li cihê xwe yê kevn in.

Hinek jêder Canbegan girêdayî Bexdiliyan dest nîşan dikin. "Bexdilî yek ji 24 zendên Oxûzan e. Di deftera Osmaniyan a Tahrîr de wek 'Konar-goçer Tirkmen Ekradi Taîfesî' derbas dibe. Ji keviyên Dîcle hatine Qonyayê û navê xwe dane Cîhanbeyliyê. Beşek li Akşehirê û beşek jî li Haymanê bi cih bûn."

Bi texmîna min, navê Qeremaniyan yê kevin Badilî ye yan jî Osmaniyan ewê ku ji Qeremaniyan veqetî û di çîna rêvebir re got, Bexdîlî; yanî yên bi zimanê began. Bi qasî tê zanîn, Badilî biqasî 125 êl, di dema Abbasiyan de anîne Anadolê. Wekî din, Canbeg di nava Qereçoriyan de, di nava Milan de û gelek federasyonên din de jî xûya dikin.

**Canbeg lingekî dewleta Qeremaniyan e**

Zenda Canbegê bi navê "Heft Zend" di dema Osmaniyan de li Kutahya-Sarisu û Qereçamê bi cih kirin. Îzî jî li ser vê yekê dibêje, "Canbeg ji Bexdîliyên Oxûzan e. Bexdilî, yek ji pênc êlan e ku hukumdar derxistiye. Li bakurê Suriyê, milê Tirkmenên Bozok pêk tînin. Di nava Tirkmenên Helebê de jî hene û di avabûna dewleta Safewî de cih girtine."

**Cihên Canbeg-Qeremaniyan**


Ji wê desthilatdarî û rêxistina bi hêz jî tê fêhmkirin ku Canbeg lingekî dewleta Qeremaniyên bi hêz bûye. Yên li Anadolê manî, navê xwe dane ser qeza Cihanbeylî û wekî din jî, di navbera Polatli û Cihanbeyliyê de li Sêwas, Semsûr û gelek bajarên din jî Canbeg-Qeremanî hene.

**Dînê Qeremanîyan**

Li ser ola Qeremaniyan ev hevoka li jêr gelek agahiyan dide. Li gorî dîroknûsên wê demê, ji Qeremaniyan re "Qizil borklû û ayaxi çarikli-Kumsor û ling bi çarox/kaloş" dihate gotin. Ew kumsorî dê piştre bizivre, Sersoritî-Qizilbaşîtî-Elewîtî û Şîîtiyê. Îro Qeremaniyên li navênda Anadolê misilmanên Sunî, yên li Xorasanê jî şîî ne.

❑ Ji wê desthilatdarî û rêxistina bi hêz jî tê fêhmkirin ku Canbeg lingekî dewleta Qeremaniyên bi hêz bûye. Yên li Anadolê mayîn navê xwe dane ser qeza Cihanbeylî û wekî din jî di navbera Polatli û Cihanbeyliyê de, li Sêwas, Semsûr û gelek bajarên din jî Canbeg-Qeremanî hene.

www.arsivakurd.org



# Şoreşê ji Kobanê dest pê kir

Ehmed ŞEXO*

Piştî destana Kobanê, ji aliyên dostên kurdan ve 1'ê Mijdarê Roja Kobanê ya Cîhanê hate îlankirin. Gelo Şoreşa 19'ê Tîrmehê di rewşeke çawa de dest pê kir, destana Kobanê di rewşeke çawa de pêk hat û piştî destana Kobanê rewşa bajarê çawa ye?

Gelek sedem hebûn ku li Kobanê Şoreşa 19'ê Tirmehê dest pê bike. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan cara ewil di Kobanê re derbas bû û deriyê Rojava vekir. Kobanê xwedî şansek bû ku Ocalan li vir ma û bandoreke baş li ser gel hişt. Bi vê re rêxistina tevgera azadî a Rojava dîsa li Kobanê pêk hat. Li Kobanê beriya niha jî zemîna welatparêziyê hebû, lê piştî van bûyeran li Kobanê welatparêzî xurtir bû. Şehîdê tevgera azadiyê yê yekemîn jî bi navê Fîraz û şehîda jin a yekemîn bi navê Dîcle ji Kobanê derketin.

**Derxistina BAAS'ê ji Kobanê**

Cografyaya Kobanê demeke dirêj ji aliyê rejîmê ve hatibû dorpêçkirin. Rejîma BAASê dixwest li dora Kobanê Kemera Ereb saz bike. Di encama dorpêçkirinê de zarokên Kobanê piranî koçberî derve bûbûn. Derfeta xwe îfadekirinê nemabû. Tevî zilm û zoriyê Kobaniyan dest ji çand, huner û azadiya xwe berneda. Ji ber ku gelê Kobanê girêdayî axa xwe bû, nehişt li vir kemer were sazkirin. Tu car destûr nedan ku biyanî werin axa wan dagir bikin.

Bi destpêkirina şer, hêza me siyasetê baş xwend û xeta sêyemîn da pêşiya xwe. Siyaseta li ser esasê hêza xwe û li gora berjewendiyê gel şopand; nebû alîgirê hêzên din. Esasên parastina gel û axa welat da diyarkirin. Ji bo vê jî rêxistina civakê hate çêkirin; meclîs hatin avakirin. Di nava van meclîsan de komîteyên ku dikarin li ser erdê kar û xebatê bikin hatin avakirin. Weke mînak; komîteyên parastinê, komîteyên xizmetê, yên çareserkirina pirsgirêkên gel, yên dadê û her wiha di her alî de xurt hatin avakirin. Nehiştin ku saziyên dewletê yên li Kobanê bixebitin. Tu carî serdana gel li rejîmê çênebû. Hemû kar komîteyên ku hatin avakirin bi rê ve bir. Wê jî hişt ku fonksiyona rejîmê li Kobanê nemîne. Bi vî awayî rejîmê BAASê tenê di nava çar diwaran de weke şekil mabû.

**Rihê welatparêziyê Kobanê rizgar kir**

Beriya ku DAIŞ êrîş bibe ser Kobanê, di Tirmeha 2013'an de çeteyên ku xwe weke Artêşa Azad a Suriyê binav dikirin di ser Girê Sipî re êrîşê Kobanê dikirin û piştre êrîşên xwe berfireh kirin. Gava êrîş hatin ser Kobanê, hêzên YPG û YPJ pir kêm bûn, derfetên me yên çekan jî gelek kêm bûn. Lê Komîteya Parastinê li hundirê bajêr û gundên dora Kobanê rola xwe baş leyîst. Li gel Komîteya Parastinê komîteyên din jî amadekariyên xwe kirin û bi moraleki gelekî bilind cihên xwe di çeperên şer de girtin.

Piştî êrîşên mezin, biçûk heta mezinên Kobanê jî xwe di nava parastina Kobanê de dîtin. Êrîşan nêzî du salan berdewam kir. Piştî êrîşên Artêşa Azad a Suriyeyê, yên DAIŞê jî dest pê kir. Nav DAIŞ bû lê hemû hêzên dijminê gelê kurd di nava wan de cîh digirtin. Di bin kincên DAIŞ de Tirkiye, Iraq, Îran, Sûriye û her wiha yên ku berjewendiyên xwe li Kurdistanê hene, ên ku nedixwestin Rojavayê Kurdistanê bibin desthilat û xwedî maf, êrîş anîn ser bajarê.

Bi ya wan, Kobanê di nava Rojava de cîhê herî lewaz bû û dikarin desteser û dagir bikin. Wisa hesab dikirin ku bi dagirkirina Kobanê dikarin derbeyekê li Şoreşa Rojavayê bixin. Naxwazim bi kurahî têkevim nava berxwedan û têkoşîna Kobanê. Ji ber ku hemû dinya dît ku li Kobanê çi destan hate nivîsandin. Dinya tevahî gihîşt heqîqeta şervanên ku li Kobanê berxwedan û destanên dîrokî tomar kirine.

◆ Bi destpêkirina şer, hêza me siyasetê baş xwend û xeta sêyemîn da pêşiya xwe. Esasên parastina gel û axa welat da diyarkirin, rêxistina civakê çêkir. Nehiştin ku saziyên dewletê yên li Kobanê bixebitin. Wê jî hişt ku fonksiyona rejîmê li Kobanê nemîne.

**Pozîsyona rêvebirên Kobanê û ya min**

Bi giranbûna êrîşan dema ku êdî şervanên YPG û YPJ bûn mertal ji bo ku bikaribin sivîlan biparêzin, weke meclîs me jî jî biryar girt ku hin rêvebir derbasî Bakur bibin, hinek jî bikevin nava berxwedanê. Me kir ku wendahiyên mezin dernekevin holê.

Ez jî weke şexs li Kobanê mam û ketim nava parastina Kobanê. Min jî di nava berxwedana Kobanê de cîh girt û birîndar bûm. Rewşa rêveberiyê li ser şervanan bandorek erênî çêkir. Wan ji me û me jî ji wan moral girt. Ez dikarim bêjim di wê rewşê de biryara ku me girt, ji her aliyan ve baş bû. Rêvebirên ku derbasî Bakur bûn, li wir gel rexistin kirin û hiştin ku bi sedan ciwan vegerin Kobanê û di nava berxwedanê de cih bigrin. Beşê ku di nava Kobanê de mayî, bi tevahî kar û xebatên ku ji wan hatî xwestin kirin. Ji bo pêwistiyên şervanan, ji bo veşartina şehîdên berxwedanê û ji bo rêkûpêkkirina karên din xebitîn. Dîrok şahîdê vê yeke ye, gelek endamên me canê xwe dan di oxira azadiyê de û gelek endamen me jî di vê berxwedanê de gazî bûn.

**Serketina Kobanê, serketina projeya Xweseriya Demokratîk bû**

Gava bajêr ji sedî heştê ket destê çeteyan û tenê du tax di dest me de ma jî biryariyekî berxwedanê li gel her kesî hebû. Me her tim dengê çeteyan dibihîstin, rojê bi sedan bombe li ser me de dibariyan. Tevî van dijwariyan di hizra tu kesî de derbas nedibû ku Kobanê wê bikeve an jî wê paş de gav were avêtin. Li ser banga Rêber Apo ya seferberiyê her kes berê xwe da Kobanê. Dema Kobanê tenê xwe nehiştin, moral û biryar hîn xurtir bû, gel rabû ser piyan û êdî ne mumkûn bû ku encam neyê standin.

Rastiyek derketibû holê ku ketina Kobanê, ketina hemû kurdan bû. Û serketina Kobanê jî wê bûba serketina hemû kurdan. Me baş dizanî ku serketina Kobanê, serketina projeya Serok Apo ya Xweseriya Demokratîk e. Her çiqas şer giran dibû, bawerîya şervanan jî xurtir dibû. Bi taybetî jî şerê herî giran a roja 29'ê Mijdarê hate jiyîn û deriyê sînora ji aliyê Tirkiyê ve êrîş hat kirin jî moral û motîvasyona şervanan neşikest. Mîna Omer Muxtar lingên xwe li hember tankê Îtaliyan zincîr kir, hevalên me yên di tepeya Dolê de jî biryara paşde vekişanê red kirin û gotin, "Tankên dijmin ser canê me re derbas bibin jî em paşve nakişin, Kobanê bernadin". Bi vê bîr û baweriyê Kobanê serket.

**Serketina Kobanê ji roja 29'ê Mijdarê diyar bû**

Serkeftina Kobanê ji zû ve diyar bû. Roja 29'ê Mijdarê çeteyan hemû derfetên xwe kar anîbûn û nekarîbûn bihostekê pêş ve biçin, piştî wê êrîşê êdî roj bi roj çeteyên DAIŞ'ê lewaz bûn û paşde gav avêtin. Êdî xuya bû ku dûr yan nêzik, dê Kobanê biser keve. Coşa serkeftinê di wê demê de bi herkesi re çêbû. Dema ku kolan bi kolan, mal bi mal ji DAIŞ dihate rizgarkirin, moral hîn xurtir dibû. Dema 27'ê Çileyê 2015'an taxa herî dawî hat rizgarkirin, coş û moralê tevahî gelê Kurdistanê gihîşt astekî herî bilind. Lê coşa ku şervan û gelên Kobanê jiyan dikir, nayê jibîrkirin û nayê bilêvkirin. Hestekî weke ji nû ve rih pê hatina miriyekî bû. Ji ber ku ew serkeftinê roj bir roj jiyan kirin, kêlî bi kêlî şopandin û gelek bedel dan. Ew hevalên ku bûbûn perçeyek ji jiyana me, di oxira azadiyê de canê xwe dan nayên jibîrkirin.





Bi rastî serkeftina Kobanê ewqas mezin bû ku ez nizanim vê vejîna nû bi çi rengî diyar bikim.

**Pirsgirêkên Kobanêya wêranbûyî**

Piştî serkeftinê gava gel vegeriya Kobanê û dema malên xwe yên wêrankirî temaşe dikir jî bi moraleki gelek bilind nêzîk dibû. Ji ber ku serkeftina dîrokî moral dida wan. Dema gel derbasî Bakur bûbû jî soza vegera axa xwe dikir û li ser soza xwe ma. Gelek bêderfetiyan ve rûbirû man lê dev jê bernedan. Şaredariyên Bakûrê Kurdistanê barekî gelekî mezin dan ser milên xwe û jî Kobanê re bûn alikar. Kavil (enqaz) rakirin, mal ava kirin, barê me hinekî sivik kirin. Ev yek moral da gel. Tevî hemû bêderfetiyan meclîs dest bi karê xwe kir; xizmet da destpekirin. civîn li dar xist û rewşa Kobanê li gel re hate diyarkirin.

**Rewşa îro**

Îro rewşa Kobanê gelek hatiye guhertin. Ne tenê li gorî dema şer, li gorî dema rejîma berê jî rewş gelekî hatîye guhertin. Hem ji nû ve avakirina avahiyan hem jî rêxistinkirina gel gihîştiye asteke bilind. Tengasiyên ku berê gel dikişand, niha gelekî kêm bûne. Pêwîstiyên gel di hemû aliyan de tên peydakirin. Gava em Kobanê û tevahî Suriyê bînin ber çav, em dikarin bêjin Kobanê kantona herî pêşketî ye di aliyê peydakirina pêwîstiyan de.

Heta roja îro jî em rewşeke dorpêçkirî dijîn. Di aliyê pisporan de kêmayî heye. Di encama koçberiyê de gelek kes çûn Ewrûpa û deverên din û venegeriyan. Derfetên tunehî li holê ne lê karên şaredarî, rêveberî û saziyan kirine, ne kêm in; qet valatiyê nahêlin. Roja ku şer qediya heta roja îro li Kobanê tu teqîn çênebûye. Ji ber ku ewlehiya me gelek xurt e. Em dizanin valahî mirinî ye.








### Di serketina Kobanê de rola Bakur

Yê ku Kobanê biser xist, Bakurê Kurdistanê ye. Eger em sedemên serkeftinê Kobanê bikin rêzê, ji sedî sed Bakurê Kurdistanê di rêza yekemîn de ye. Xebata ku Bakurê Kurdistanê ji bo Kobanê kirî, kesekî nekir. Sekna wan a li ser sînor, şandina zarokên xwe ji bo şerê Kobanê -ku bi sedan şehîd ketin-, li xwedî derketina koçberên Kobanê û rê vekirina şervanên ku li çiyayên Kurdistanê hatin tu carî nayê jibîrkirin. Heta em dikarin bêjin pêwîstî û lojîstîka şervanên Kobanê, ji aliyê gelê me yê Bakur ve dihat kirin. Lewra Bakurê Kurdistanê can da, xwîn da, piştgirî da, moral da, lojîstîk da.

### Baldarî û elaqeya navneteweyî

Cîhanê temaşe kir ka Kobanê çawa dikeve. Eger armanca hêzên navnetewî parastina Kobanê bûbûya, nedihişt çeteyên DAIŞ'ê bihustekî jî nêzî Kobanê bibe. Di nava îtifaqekê de bûn. Piştî bîst rojan dema berxwedana dirokî deng veda, civata navnetewî jî neçar ma ku alîkar be. Lê ev alîkarî tenê şandina çekan û desteka hewayî ve bi sînor ma.

Me hêvî dikir piştî azadiyê ji bo ji nû ve avakirina Kobanê piştgiriyek navnetewî were kirin, lê sozên ku hatin dayîn nehatin cih. Heta roja îro jî Kobanê bi imkanên xwe debara xwe dike û xwe ji nû ve ava dike. Welatiyan bi îmkanên xwe yên pir kêm mal û taxên xwe ava dikin. Ji êrîşên çeteyan dibîstan, kanalîzasyon, elektrîk û şebekeyên avê ji sedî 90 hatin ruxandin, mixabin me tu alîkariya navnetewî nestand. Hin saziyên navnetewî ji bo ku rûyê xwe sipî der bixin, hin pêdiviyên xwarinî anîn û dan gel, wekî din tu alîkarî nehatin. Kobanê bû kela berxwedanê, destan nivisand û bû rûmeta hemû mirovahiyê; li hember van bedelan jî pêwîst bû hêzên navnetewî jî xwedî li Kobanê derketana.

Li gel vê, beriya demekê dostanî mîna bi bajarên Durango û Guernîkayê hate çêkirin. Em hevî dikin ku bandorek erenî pêşeroja Kobanê û bajarên din bike. Ku ji destê me bê, em dixwazin hemû aştîxwazên dinyayê re hevdîtinan pêk bînin û dostaniyan xurt bikin. Kobanê bu nîşana berxwedanê, bû temsîla Kurdan di qadên navnetewî de û dema Kobanê tê gotin, gelê Kurd tê bala her kesekî.

Dîsa gelek ciwanên navnetewî hatin di berxwedana Kobanê de cîh girtin û xwîna xwe tevlî xwîna Kurdan kirin. Li ser vî esasî em li xwîna wan pakrewanan xwedî derkevin.

Îro erkeke exlaqî ye ku tevahî dinyayê xwedî Kobanê derkeve û bi Kobanê re dostanî girê bide. Em bi dostaniya wan bajaran gelekî kêfxweş in û amade ne ku hemû bajarên dinyayê re dostaniyên xwe deynin û xurt bikin.

### Berxwedana Kobanê bi dawî nebûye

Xwedî derketina Kobanê li ser herkesî ferz kir ku bibe rojeke dirokî û 1'ê Mijdarê ji bo Kobanê hat veqetandin, da ku weke rojeke normal neyê derbaskirin. Divê berxwedana ku li Kobanê qewimî em jiyan bikin û hîs bikin. Di vê rojê de gerek e em ji dinyayê re bêjin, berxwedana Kobanê hîn bi dawî nebûye. Jiber ku êrîşên li ser Kurdan û li ser Kobanê hîn bi dawî nebûne, dewam dikin. Ji bo ku carek din rojên reş li ser Kurdan û mirovahiyê de neyên. Divê em berxwedana Kobanê nûjen bikin û careke din xwedî li berxwedanê derkevin û tevahiya mirovahiyê ji dijminê mirovahiyê rizgar bikin. Bi hezaran kîlometreyan ji hev dûr jî bin dilê me yek e. Em bi hev xurt in û bi hev hêz in. Heta hemû gel yekîtiya xwe xurt nekin, çi li Ewrûpa çi li welêt bin bi hev xwedî dernekevin, wê êrîşên hovane her tim li ser me bin. Encax dikarin bi yekîtiya navbera xwe êrîşan vala derxînin.

**** Ev nivîs ji hevpeyvîna Erkan Guelbahçe bi Hevserokê TEV-DEM'ê yê Kantona Kobanê Ehmed Şêxo re hatiye berhevkirin.***


◆ Bi giranbûna êrîşan dema ku êdî şervanên YPG û YPJ bûn mertal ji bo ku karibin sivîlan biparêzin, weke meclîs me jî biryar girt ku hin rêvebir derbasî Bakur bibin, hinek jî bikevin nava berxwedanê. Rewşa rêveberiyê li ser şervanan bandoreke erênî çêkir. Wan ji me û me jî ji wan moral girt.







www.arsivakurd.org



www.arsivakurd.org

# Ji kêfan difire

Ev wêne li navçeya Rihayê Wêranşarê hatiye girtin. Li taxa Eyûbnebî sala 2006´an. Ev dever ji bo Xiristiyanan jî pîroz e. Gava ku cara duyem ez bi hevalên xw eyên Norwêcî re çûm deverê, ji me re xweş li hev hat û em rasta daweteke gelekî xweş hatin. Xwarina dawetê hat xwarin, govend hat gerandin. Min xwest daholvên tevî cilûbergên wî yên gelêrî û tevgerên wî yên taybet bi wî di kadrajê de bi cih bikim. Armanca min ew bû ku ez daholvên karibim bêhtir kite bi kite bidim nîşan, di vê yekê de jî bawer dikim ez bi ser ketim. Gava ku ji bo wêne bigirim min xwe li ser erdê dirêj kir, ew bi aliyê min ve hat û dema ez wisa dîtim, hew xwe girt û keniya. Ha wê kêliyê ev fotograf hat girtin. Li pişt daholvên jî Norwêciyek heye ku ev cara ewil e xwe fêrî gerandina govendê dike. ■ Gökmen ONAY